# Qurbaniyên qaçaxçîtiya mirovan, îstismarkirin yan qezayeke kar

## Ez çawa dikarim daxwaza berdêlê bikim?



FEDERAL PUBLIC SERVICE
JUSTICE

.be

# Naverok


**Qurbaniyên qaçaxçîtiya mirovan:**

**Meriv çawa daxwaza berdêlê bike?** 4

- Kîjan xizmet dikarin alîkariya min bikin? 4
- Rêbaza daxwaza berdêlê 5
- Gavên ku divê bavêjim 6
- Dezgehên ku dikarin alîkariya min bikin 8

**Qurbaniyên îstismarkirinê: vegeranadina meaşên paşdemayî û mafên din ên civakî** 11

**Qurbaniyên qezayeke kar: çawa ragihînin** 14

**Pêwendî** 15




**Hûn qurbaniyên qaçaxçîtiya mirovan, îstismarkirin** an **qezayeke kar in ?**

Hûn dikarin hin gavan bavêjin da ku **daxwaza berdêla ziyana xwe** bikin, **meaşê paşdemayî** wergirin yan jî ziyaneke têkildarî kar **ragihînin**. Ne hewce ye ku hûn bi tenê vê yekê bikin. Hin rêxistin hene ku yê alîkariya we bikin.

Di vê belavokê de hûn ê bibînin ku kîjan **dezgehên piştgiriyê yên taybetî** dikarin wekî qurbanî **alîkariya** we bikin.

**Baldarî :** Ji kerema xwe ji bîr nekin di gavên ku hûn wek qurbanî davêjin de **hertim bijardeyeke we heye**, û hemî rê xwedî **başî û nebaşî** ne. Misogeriyek tuneye ku hûn ê berdêla ku dixwazin bistînin.



# Qurbaniyên qaçaxçîtiya mirovan : Meriv çawa daxwaza berdêlê bike?

## Kîjan xizmet dikarin alîkariya min bikin?

Eger hûn **qurbaniyên qaçaxçîtiya mirovan** in, navendeke taybet wekî **PAYOKE, PAG-ASA yan SURYA** dikare hevrêtiya we bike. Ev navend **piştevaniyeke derûnî, bijîşkî û dadwerî-îdarî** didin we, we ji **mafên xwe wekî qurbanî** agahdar dikin û ji we re şirove dikn çawa **daxwaza berdêla ziyana** xwe bikin yan çawa daxwaza alîkariya **parêzerekî** bikin.

Bo sûd wergirtina ji vê hevrêtiyê, hûn divê hin **mercên hiqûqî tijî bikin** (bi taybet amade bin dozê vekin yan ragihînin, bi kesê sûcadr re têkiliyê qut bikin, û hwd.).

Bo zanyariyên pirtir ser van mercan, serdana **malperên** PAYOKE, PAG-ASA yan SURYA bikin.

**Hûn nikarin ji vê hevrêtiyê sûd wergirin eger:**

- Hûn amade nebin bersiva mercên qanûnê diyarkirine bidin;
- Vegeriyabin **welatê xwe yê jê tên**;
- **Qaçaxçîtiya mirovan** tunebe.

Di van rewşan de, ev navend dîsan dikarin we **agahdar** bikin û we **rênîşan** bkin ber bi:

- **nivîsgeheke alîkariya dadweriyê (BAJ)** bo girtina **parêzerekî belaş;**
- **dezgeha federal a metirsiyên pisporane (FEDRIS)** bo ragihandina **qezayeke kar;**

- **FAIRWORK Beljîka** ji bo pirsên we yên li ser mafên xwe yên kar e (eger hûn li Beljîkayê hevdem bi awayekî neqanûnî rûdinin yan jî bi mafê rûniştinê yê sînorkirî in û kar dikin).

## Rêbaza daxwaza berdêlê

Wekî **qurbaniyeke qaçaxçîtiya mirovan**, hûn dikarin ji bo ziyana xwe daxwaza berdêlê bikin bi rêya:

- dozên tawananê li dijî sûcdar (piştî gilî li bal polîs yan dezgeha lêpirsîna civakî hat kirin û eger ev yek bibe sedema dadgehîkirina sûcdar);
- dozên medenî (tenê piştî dadresiya tawananê mimkin e);
- binyadeke taybet (Komîsyona Alîkariya Malî ji Qurbaniyên Tundûtûjiya Biqestî re).



## Gavên ku divê bavêjim

Ev pêşnûma dikare kurteyeke derbasbûna ku **rêbaza tawanê dijî sûcdar** dişopîne nîşanî we bide:

01 **Radestkirina dozê yan ragihandin**

02 **Vekirina lêkolîneke tawanê**

03 **Biryara dawîn a dadwerê cezakirinê : mehkûmkirina sûcdar û dayîna berdêla ziyanê**

04 **Gavên bo wergirtina diravê diyar ê berdêlê**

**1. Radestkirina dozê yan ragihandin**
Bo ku lêkolîneke (tawanê) bikare were vekirin, divê hûn **berê ragihandinekê bikin yan dozê li bal polîs** yan **xizmeteke din a lêpirsîna civakî bikin**.

**Baldarî :** Tenê eger hûn daxuyaniya kesê qurbanî bidin hûn dikarin pêvajoya doza xwe bişopînin. Hûn dikarin di rûniştina dozê de li birêveberiya polîsan an jî li nivîsgeha lêpirsîna civakî îfadeya kesê ziyandîtî bişînin, lê hûn dikarin paşê jî bi xwe bidin an jî bi îmzeya xwe bişînin dozgeriya komarê, yan jî ji parêzerê xwe bixwazin vêya bike.





Ma hûn bixwe doza xwe yan îfadeya xwe didin polîs yan mufetîş? Wê demê Navenda Piştgiriya QurbaniyanCentrum yan Algemeen Welzijnswerk (CAW) dikare bi piştgiriya îdarî û hestyarî ji we re bibe alîkar.

**2. Daxwaza berdêla ziyanê kirin**
Piştî ku doz yan daxûyanî tê kirin, wezareta giştî biryar dide ka delîlên bes hene ku doza we bibin dadgehê yan na.

**Eger wisa be,** hûn dikarin **daxwaza berdêla ziyana** xwe bal **dadwer** bikin**.**

**Baldarî : Piştî mehkûmkirina** sûcdar hûn dixwazin berdêlê bixwazin? Ev bi **rêbazeke medenî** mimkin e.

## Dezgehên ku dikarin alîkariya min bikin

Di derbarê dozên tawanê yan medenî de, hûn dikarin daxwaza alîkariyê bikin ji:

- **alîkariya dadweriyê ya xetê yekem :**
  Ew tewsiyeya hiqûqî ya destpêkê belaş dabîn dike eger hûn bixwazin berdêlê wergirin, agahdariya pratîkî dide we, we vedigerîne xizmetên din û bersiva pirsên qanûnî yên hêsan dide.
- **parêzer:**
  Tê pêşniyarkirin ku hûn bi parêzerekî re têkilî dayînin, ji ber ku ew dikare tewsiye û rêbernameyên berfireh pêşkêşî we bike, eger hûn bixwazin li berdêlekê bigerin. Alîkariya hiqûqî ya xeta duyem (BAJ) dikare, bi taybetî li gorî dahata we, daxwaza xizmetên belaş an kêmkirî yên parêzerekî bike.



- **Komîsyona Alîkariya Diravî ji Qurbaniyên Tundûtûjiya Biqestî re:** Ev rêxistin **alîkariya darayî** dike dema ku:
  - hûn **qurbaniyê tundûtûjiya biqestî** ne ku li **Beljîkayê** hatiye kirin,
  - **Di encama vê kiryarê de we ziyaneke mezin a bedenî yan jî derûnî** dîtiye,
  - û **hemû rêyên din** ên wergirtina berdêla zirarê **neserkeftî bûne**.

**Baldarî :** Herweha hûn dikarin serî li Komîsiyonê bidin eger hûn ji Beljîkayê derkevin û hîn jî **navnîşana posteyê li Beljîkayê** hebe


4226
VALID
THRU

# Qurbaniyên îstismarkirinê: vegeranadina meaşên paşdemayî û mafên din ên civakî

Eger hûn qurbaniyê **îstîsmarê** bin, hûn dikarin hewl bidin ku **paşdemayîna meaşê xwe û mafên din ên civakî yên muhtemel** (wek mînak meaşê betlaneyê yan jî xelata dawiya salê) bidin vegerandin.

Awayê herî bilez ji bo vegerandina meaşê paşdemayî ev e ku hûn bi **kardêrê xwe re bigihîjin peymanekê**. Hûn dikarin di vî warî de alîkariyê bixwazin ji:

- **Sendîkaya** ku hûn pê ve girêdayî ne;
- **parêzerekî** ;
- **FAIRWORK Belgium**.

## Hûn nikarin bi kardêrê xwe re li hev bikin?

Wê demê hûn dikarin hewl bidin ku meaşên xwe yên paşdemayî yan mafên civakî yên din vegerînin:

- bi dayîna **daxuyaniyekê** bal **beşa Kontrola Qanûnên Civakî (CLS);**
- yan **ev dikare bi birina meseleyê bal Dadgeha Kar** were kirin. Di vê rewşê de, tê pêşniyarkirin ku hûn alîkariya parêzerekî bixwazin.

Li ser bingeha delîlên ku hûn pêşkêş dikin, CLS dikare hewl bide ku kardêrê we razî bike ku heqê we vegerîne.

## Gelo hûn nikarin kardêrê xwe bi xizmetên CLS razî bikin?

Eger wisa be, CLS dikare doza we ji **Lênêrînerê Kar re bişîne**. Piştre renge ku Lênêrînerê Kar biryar bide ku kardêrê we **mehkeme bike**. Di vê rewşê de, vegerandina meaşên we yên paşdemayî ji hêla kardêrê we ve gengaz e, tevî ku hûn berê vegeriyabin welatê xwe.

**Baldarî :** Ji bo ku hûn wêya bikin, divê hûn **Daxuyaniyeke Ziyandîtinê bidin.**

**Eger vegerandin demildest neyê kirin** (wek mînak ji ber zanyariyên kêm), dê dirêv bidin **Sindoqa Spartin û Emanetan**. Di vê rewşê de, bi wê re têkilî dayînin da ku dirêv bixwazin (li "Têkilî" binêre).

## Bo hêmanên jêrê baldar bin:

- Eger dadwer daxwaza we ya berdêlê qebûl bike, hûn dikarin hewl bidin ku vê berdêlê bi rêya her **diravê** ku ji mehkûmê ku ji we re deyndar e û hatiye **girtin** û **standin** wergirin. Parêzerê we dikare ji Organa Navendî ya Girtin û Standinê (COSC) bixwaze ku dirêv azad bike.
- Eger **îmkanên madî yên mehkûm têra xwe** tunebe, **misogeriya vegerandinê** tuneye.
- Eger hûn ji bo parêzerekî belaş **mercên we têr nekin** divê **heqê parêzerê xwe bidin**.
- Eger kardêrê we îflas bike, divê hûn **di wextê xwe de serî** li rayedarekî têkildar (pêbawerê îflasê) **bidin**.
- Herweha hûn dikarin bi riya regsol daxwaznameyeke online bişînin: www.regsol.be
- Rêbaz dikarin **dirêj** bin.

**Baldarî:** eger hûn êdî li Beljîkayê najîn, bi parêzerê xwe, navenda pispor an jî xizmeteke din a ku di dema doza we de li Beljîkayê piştgirî daye we re têkilî dayînin.



# Qurbaniyên qezayeke kar: çawa ragihînin?

Eger di kar de qezayeke we çêbibe, hûn dikarin bi rêya **sîgorteya qezaya kar** ji kardêrê xwe reragihînin.

Eger ew **sîgorteya** xwe ya **qezaya kar** tunebe, têkilî dayînin bi:

- **Sendîkaya** xwe;
- **FAIRWORK Belgium**;
- yan **parêzerekî** re.

Bi rêya yek ji van dezgehan, imkana we heye **ragihandinê bidin Dezgeha federal a metirsiyên pisporane (FEDRIS)**.

> **Baldarî :** divê hûn doza xwe **di nav sê salan de** piştî qezaya kar tomar bikin.

Li gorî giraniya qezaya kar û berpirsiyariya kardêrê we ya di qezayê de, dibe ku dozgeriya giştî an jî muxalefeta kar **lêpirsînê** vekin. Eger qezaya kar were naskirin, divê **sîgorteya qezaya kar an FEDRIS mudaxele** bike:

- xercên bijîşkî,
- nikarîna karkirinê ya hertimî yan demkî.



# Contact

- **Centres spécialisés pour les victimes de la traite des êtres humains**
  - **SÜRYA** (Wallonie)
    T 04 232 40 30
    E-mail : info@asblsurya.be
    www.asblsuraya.org/fr/contact
  - **PAG-ASA** (Brussels)
    T 02 511 64 64
    E info@pag-asa.be
    www.pag-asa.be
  - **PAYOKE** (Flandre)
    T 03 201 16 90
    E admin@payoke.be
    www.payoke.be
- **Agence fédérale des risques professionnels (FEDRIS)**
  www.fedris.be/fr/contact
- **FAIRWORK Belgium**
  T 0800 12019 (le lundi et le mercredi de 9h à 13h et le jeudi de 13h à 16h)
  E info@fairworkbelgium.be
  www.fairwokbelgium.be/fr



- **Nivîsgeha alîkariya dadweriyê (BAJ)**
  (parêzerê belaş)

  - **Wallonie**
    - www.avocats.be/fr > komîsiyona alîkariya dadweriyê

  - **Brûksel**
    - FR www.bajbruxelles.be/index.php/fr
      T 02 511 50 45
      E bjb@baliebrussel.be
    - NL www.baliebrussel.be

  - **Flandre**
    - www.vlaanderen.be > Conflicten en misdrijven > Commissies voor juridische bijstand
    - https://www.prodeoadvocaat.vlaanderen > Têkilî > Bureau juridische bijstand

- **Xizmeta Alîkariya Qurbaniyan**
  www.victimes.cfwb.be/ou-trouver-aide

- **Het Centrum Algemeen Welzijnswerk (CAW)**
  www.caw.be

- **Sindoqa Spartin û Emanetan**
  T 02 572 57 57
  E info.cdcdck@minfin.fed.be
  www.finances.belgium.be/fr > FAQ > Sindoqa Spartin û Emanetan : tiştên giştî > « Baştirîn rêya pêwendiya digel Sindoqa Spartin û Emanetan çi ye? »

- **Kontrola qanûnên civakî (CLS)**
  T 02 235 55 55
  E (fr) info.cls@emploi.belgique.be
  E (nl) info.tsw@werk.belgie.be
  E (de) info.cls@beschaeftigung.belgien.be
  T (fr/de) 02 235 55 60

  https://emploi.belgique.be/fr > Li bara SPF > Binesaziya SPF > Lêpirsîna kar – Birêveberiya giştî Kontrola qanûnên civakî > Birêveberiyên derve

## Pirsên we hene ? Hûn ê zanyarên pirtir di van belavokan û malperan de bibînin

- Belavoka « Hûn qurbanî ne »
  https://justice.belgium.be/fr > Weşanxaneya > Belavokên bo welatiyan > Hûn qurbanî ne

- Malpera rûpela « Wekî qurbanî çi bikin »
  https://justice.belgium.be/fr > Mijar û dosye > Çi bikin wekî > Qurbanî

- Belavoka « Mafên we wekî qurbaniyên tawanan »
  https://www.tribunaux-rechtbanken.be/fr > Zanyariyên mifadar > Belavok > Mafên we wekî qurbaniyê tawananekê

- Malpera rûpelê « Zanyariyên ser derbasbûna rêbaza wekî qurbanî »
  https://justice.belgium.be/fr > Mijar û dosye > Çi bikin wekî > Qurbanî > Rêbaz > Derbasbûna rêbazê

- > Malpera rûpelê « Zanyariyên bo qurbaniyên karên biqestî yên tundûtûjiyê »
  https://justice.belgium.be/fr > Mijar û dosye > Çi bikin wekî > Qurbanî > Alîkariya malî > Qurbanî >karên biqestî yên tundûtûjiyê.



RESPONSIBLE PUBLISHER: JEAN-PAUL JANSSENS BD DE WATERLOO 115 -1000 BRUSSELS - D/2022/7951/EN/1281

Xizmeta Têkilî û Zanyariyan
Boulevard de Waterloo 115
1000 Brussels
T 02 542 65 11
www.justice.belgium.be